Kurdish | Kurdi Kurmanci

NYC Mayor's Office of Immigrant Affairs

# ÇAVKANÎ JI BO NEW YORKIYÊN KOÇBER

## BÊYÎ LI BER ÇAVGIRTINA REWŞA WE YA KOÇBERIYÊ, BAJARÊ NEW YORKÊ JI BO ALÎKARIYA WE LI VIR E.

### Alîkariya Hiqûqî ya Koçberiyê

**Ji bo alîkariya hiqûqî ya belaş û ewle di karûbarên koçberiyê de, têkiliyê deynin bi nimreya 800-354-0365**, ji Duşemê heta Înê, saet 9-ê sibê heta 6-ê Êvarê.

### Karta nasnameyê ya bajarê New Yorkê

**Ji bo IDNYC daxwaz bikin**, karta nasnameyê ya şaredariyê ku bo hemû niştecîhên bajarê New Yorkê yên 10 salî û jortir belaş e. Ji bo nûkirina serxet an diyarkirina dema qeydkirinê, **telefonî 311** an serdana **nyc.gov/idnyc** bikin.

### Polên (dersên) zimanê Îngilîzî

Di her dem û her derê de beşdarî polên **Îngilîzî yên belaş** bibin. Ji bo agahiyên zêdetir serdana **wespeaknyc.cityofnewyork.us** bikin.

### Lênêrînên tenduristî û dermankirinê

**NYC Health + Hospitals (H+H)** dikare lênêrîna hawarçûnê, xizmetên dermankirinê yên bingehîn, kontrolkirin, vaksîlasyon û gelek tiştên din pêşkêş bike.**Têkiliyê deynin bi nimreya 1-844-NYC-4NYC (1-844-692-4692) da ku hûn ber bi navenda herî nêz ve bên arastekirin.** Ji bo piştgiriya veşartî û girêdana bi navendên lênêrîna tenduristiya derûnî û çavkaniyên girêdayî xirab-bikaranîna madeyan **NYC Care** bi nimreya, **646-NYC-CARE (646-692-2273)** re telefon bikin an herin ser **nyccare.nyc**

### Tenduristiya Derûnî

Ji bo piştgiriya veşartî û girêdana bi navendên lênêrîna tenduristiya derûnî û çavkaniyên girêdayî xirab-bikaranîna madeyan, bi nimreya **888-692-9355 an 988**, re telefon bikin an peyam bişinin **WELL bo 65173**. New Yorkî dikarin ji bo gihîştina çavkaniyên piralî yên xizmetên tenduristiya derûnî li bajarê New Yorkê serdana **nyc.gov/mentalhealthaccess** bikin, an ji bo dîtina xizmetên tenduristiya derûnî rênîşandera serxeta 988 New Yorkê li malpera **nyc.gov/mentalhealthservices** bikar bînin.

### Barûdoxên lezgîn

**Di rewşên lezgîn de, bi 911 re telefon bikin.** Rewşa lezgîn ji her pozîsyonekê re tê gotin ku tê de hewcedarî bi alîkariya bilez a polîs, vemirandina agir an ambûlansê hebe. **Li gorî qanûnê, Îdareya Polîsê Bajarê New Yorkê (New York City Police Department) nikare derbarê rewşa koçberiyê ya qurbaniyên tawanan, şahidan an kesên din ên ku daxwaza alîkariyê dikin, pirsan bipirse.**

### Perwerdehiya Giştî

**Hemû zarokên niştecihên bajarê New Yorkê yên ji temenê 4 heta 21 salî dikarin di dibistanên giştî de perwerde bibin.** Ji bo qeydkirinê, serdana **schools.nyc.gov/fwc** bikin an re telefon bikin bi **311.**

### Çavkanî û agahiyên giştî yên bajar

Hewcedariya we bi gihîştina çavkaniyên bajarî heye an hûn dixwazin pirsgirêkekê rapor bikin?
Bi **311** re telefon bikin an serdan vir bikin **portal.311.nyc.gov**

### Xeta Taybet a Karûbarên Koçberan a Bajarê New Yorkê

**Bi xeta me ya taybet bi nimreya 212-788-7654** ji duşemê heta înê, saet 9-ê sibê heta 5-ê êvarê telefon bikin, an emailekê ji vê navnîşanê re bişînin **askmoia@cityhall.nyc.gov**

NYC Mayor's Office of Immigrant Affairs

# ÇAVKANÎ JI BO NEW YORKIYÊN KOÇBER

## BÊYÎ LI BER ÇAVGIRTINA REWŞA WE YA KOÇBERIYÊ, MAFÊN WE HENE.

### Dûrketin ji Xapandina Koçberiyê

Eger pêdiviya we bi şêwirmendiya hiqûqî ya koçberiyê hebe, tenê bi parêzerekî xwedî lîsans an nûnerê pejirandî yê wezareta dadê (Department of Justice, DOJ) re biaxivin. Hûn dikarin lîsteya dabînkerên rayedar û naskirî li vê navnîşanê bibînin **nyc.gov/immigrationfraud**

### Mafên di dema rûbirûbûna efserên bicihanîna qanûnên koçberiyê de

Bajarê New Yorkê ne efserê bicihanîna qanûnên koçberiyê ye. Eger efserên federal ên bicihanîna qanûnên koçberiyê nêzîkî we bûn, mafên we hene. Serdana **nyc.gov/knowyourrights** bikin an bi xeta me ya taybet a hiqûqî ya koçberiyê ya belaş bi nimreya **800-354-0365** re telefon bikin

### Mafên Karkeran

Li gorî qanûna bajarê New Yorkê, mafê we yê bikaranîna destûra nexweşiyê ya bi mûçe, mûçeya herî kêm, mûçeya dema zêde û tiştên din heye. Ji bo gihîştina çavkaniyan serdana **nyc.gov/workers** bikin an telefonî vê nimreyê bikin **212-436-0380**

### Raporkirina Cudakariyê

Acizkirin û cudakarî li gorî qanûna mafên mirovan a bajarê New Yorkê neqanûnî ye. Ji bo raporkirina cudakariyê, ji kerema xwe bi nimreya **212-416-0197** re telefon bikin an serdana vir bikin **nyc.gov/reportdiscrimination**

### Parastina li Hember Şideta Navmalî

Eger hûn rastî reftarên xirab an azaran tên, bajarê New Yorkê ji bo alîkariya we li vir e. Hûn dikarin serdana navnîşana **nyc.gov/nychope** bikin an bi xeta taybet a şideta navmalî ya New Yorkê bi nimreya **800-621-HOPE** re telefon bikin

### Mafên Kirêdaran

Pêdiviya we bi alîkariyê di mijarên girêdayî valakirina milk an xwediyê malê de heye? Ji bo wergirtina alîkariya hiqûqî ya belaş serdana **nyc.gov/tenantprotection** bikin an bi **311** re telefon bikin û bibêjin **"tenant helpline"** (Xeta alîkariyê ya kirêdaran) ji bo alîkariya hiqûqiya belaş

### Mafê Hebûna Stargehê

Eger hûn bi bêmalî rûbirû ne, mafê we yê daxwaza stargehê heye. Bi serdana navenda wergirtinê ya ku ji aliyê îdareya xizmetên kesên bêmal (Department of Homeless Services, DHS) ve hatî diyarkirin, bigihîjin xizmetên stargehê. Bi telefonkirina nimreya **311** agahiyên zêdetir wergirin

### Piştgiriya Miştêrî

Pirsgirêka we bi karsaziyek an firoşgehekê re heye? Wekî miştêriyek, mafên we hene. Bi serdana **nyc.gov/consumers** an telefonkirina bi **311** re gilî û gazina xwe qeyd bikin